NHS Scotland COVID Status

NHS Scotland COVID Status hûrguliyên derzîlêdana/vaksînkirina te ya COVIDyê û encamên testê, û her wisa agahiyên başbûna te bi awayekî ewle vedihewîne.

Tu dikarî di dema rêwîtiya derveyî welêt de ji bo selimandina rewşa COVIDa xwe wê bi kar bînî.

Heke tu rewşa xwe ya COVIDyê ji bo gera derveyî welêt bi kar tînî, divê ku şert û mercên welatê ku tu diçiyê bi cî bînî û şertên vegera bo Skotlandê zanibî.

Rêya herî hêsan û ewle ji bo selimandina rewşa xwe ya COVIDyê bikaranîna NHS Scotland COVID Status ye. Teqez bike ka tu versiyona herî nû ya app'ê bi kar tînî.

Tu dikarî her wisa kopiyeke PDF bi awayê online daxînî yan jî telefonî hejmara 0808 196 8565 bikî û sertîfîkayeke derzîlêdanê ya kaxizî bixwazî. Beriya ku pêdiviya te bi kopiya kaxizî hebe wê bixwaze, lewre jê re dem divê.

Heke tu ji 16 salî biçûktir î, tu dikarî telefonî hejmara 0808 196 8565 ya Xeta Alîkariyê ya Rewşa COVIDyê bikî û kopiyeke rewşa xwe ya COVIDyê daxwaz bikî.

Heke tu 16 salî yan jî mezintir î û heke beriya 1ê gulanê NHS PCR hatibe standin, selimandina başbûnê dê bi riya sepana Rewşa COVIDê bê nîşandan yan jî pêkan e ku heta 180 rojan piştî encama testa PCR ya pozîtîv ji portala agahdariyê ya NHSê bê wergirtin. Heke tu ji 16 salî biçûktir î, ji bo daxwazkirina kopiyeke başbûnê dikarî telefonî xeta alîkariyê bikî. Heke te testeke taybet çêkiribe, ji bo selimandina başbûnê divê tu peyama telefonê yan jî emaîla ku encama PCRa te pesend dike bi kar bînî.

Gava tu versiyona çapkirî ya NHS Scotland COVID Status'ê wergirî, tu yê li jor-rastê logoyên Înglistan, Welş, Skotland û Îrlenda Bakur bibînî. Li bin logoyên çar neteweyan tîreke şîn ya ji bo ewlekariyê heye ku rê li sixtekariyan digire.

Nav û navnîşana te li gel dema name hatiye amadekirin, li jora nameyê ye.

Nav û navnîşana li ser rewşa te ya derzîlêdanê/vaksînê dê li qeydiya te ya nexweşiyê ya GPê bikin.

Heke navnîşana te ya li ser Rewşa COVIDyê ya kevn e, bi şertê ku tu nav û dîroka xwe ya rojbûnê biselimînî, tu dîsa jî dikarî wê ji bo gerên derveyî welêt û têketina deverên pêwîstiyê pê dibînin bi kar bînî.

Ji bo gera derveyî welêt hewce nake ku li ser rewşa derzîlêdanê navên duyemîn hebin.

Li ser sertîfîkayê fîlîgraneke (watermark) şîn heye ku ev taybetiyeke din ya ewlekariyê ye.

Di qutîka şîn de agahiyên derzîlêdanê hene. Ev dozên ku te wergirtine, tevî tarîxên têkildar nîşan dide.

Li bin agahiya ayîdî her dozê, barkoda 2D yan jî QR heye. Gava ev bi teknolojiya taybet bê skenkirin, ew ê orîjînalbûnê pesend bike û agahiyên derzîlêdanê nîşan bide. Vê barkodê demeke dawî (expiry) ya bikaranînê heye. Beriya vê tarîxa dema dawiyê, yan jî heke tu dozeke din a vaksînê wergirî divê ku nameyeke din bixwazî.

Agahiyên di barkoda 2D de nayên guhertin, loma jî zêdetir ewle ye.

Li bin nameyê malperek heye ku tê de tê diyarkirin ka NHS Skotland agahiyên te yên di nameyê de çawa bi kar tîne. NHS Skotland agahiyên şexsî tomar nake û agahiyan bi aliyên sêyemîn re parve nake.

Her wisa gelekî zelal e ku name nakeve şûna nasnameyê.

Heke agahiyên li ser nameya te şaş bin yan jî tu li derveyî Skotlandê hatibî derzîlêdan/vaksînkirin, tika ye bi riya telefona 0808 196 8565 ya Xeta Alîkariyê ya Rewşa COVIDyê re bikeve têkiliyê yan jî ji hinekan bixwaze ku li ser navê te pê re bikevin têkiliyê.